



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî
Xelek 21**

Serpêhatiya Rêberê Kurd Abu Muslimê Xurasanî

(7) Bi Vî Awayî Abu Muslimê Xurasanî Bi Îxanetî Hate Kuştin

Gavên Destpêkî:

Di sala 136-ê goçî / 754-ê z. dema *Abu Ce'hfer El Mensor* û *Abu Muslim* ji hecê vedigeriyan xelîfe *Eseffah* wexer kir. Karwanê *Abu Muslim* li pêşiya karwanê *El Mensor* bû, ji lewra, *Abu Muslim* nûçeya mirina xelîfe berî *El Mensor* bihîst. Rabû wî û rêveberên ku pêra bûn çûn *El Mensor* bi xîlafetê pîroz kirin. Di cihekî din da jî hatiye gotin ku *Abu Muslim* jêra nivîsandiye û serxweşiya wî xwastiye, lê ew bi xîlafetê pîroz nekiriye daku wî bitirsîne. Li ser vê yekê *El Mensor* enirî û tore bûye û nameyeka hişk ji *Abu Muslim* ra şandiye û piştî du rojan *Abu Muslim* hatiye ba wî, ew pîroz kiriye û wek xelîfe pejirandiye⁽¹⁾.

Ya girîng ewe ku *El Mensor* ji *Abu Muslim* bi kîn bû, ji şiyar û îmkanên wî pir bi tirs û sawîr bû. Berê jî bi me ra derbas bû ku wî ji birayê xwe xelîfe *Eseffah* ra pêşniyaz kiribû ku *Abu Muslim* bikuje. Lê belê, gava *El Mensor* xîlafetê wergirt, wisa da xuyakirin ku ew dostaniya wî dixwaze û pesna wî da. Sedema vê yekê ew bû ku apê *El Mensor* yê bi navê *Ebdullah Bin Elî* dijberê wî bû li ser xîlafetê. *El Mensor* baş dizanî ku ew nikare bêyî arîkariya *Abu Muslim* zora apê xwe *Ebdullah* bibe. Ji berjewenidiya wî bû ku ew wan herdiyan li ser hev tûj bike û berde hev; û kîjan ji wan biserket hîngê ewê zora yê din bibe piştî ku ew lawaz bû.

Gava *El Mensor* û *Abu Muslim* ji hecê vedigeriyan, *Abu Muslim* dît ku *El Mensor* pir bi tirse, bê aram û tebate. Rabû jêra got: Tu çima bi tirs û bê tebatî û xîlafet ji bo te hatiye? *El Mensor* got: Ez ji şerê *Ebdullah Bin Elî* û yê şî'eyên *Elî* ditirsim. *Abu Muslim* got: Tu ji wan metirse, ezê mesela wan însallah çareser bikim; piraniya leşkerên ku li gel wî ne xelkên Xurasanê ne û ew ji bin fermana min dernakevin. Wê hîngê ew tirs û bêaramî ji dilê *El Mensor* derket⁽²⁾.

Bi rastî jî, piştî demeka kurt *Ebdullah* li dijî *El Mensor* serî hilda. Wî leşkerê xwe ji welatê Şamê û Rojavayê Kurdistanê anî. *Abu Muslim* birêket û çû şerê wî. *Ebdullah* bajarê Herranê ji xwe ra wek nawend girtibû, çek û posat civandibû, senger û çeper kolabûn û xwe ji şer ra amade kiribû. Lê belê beşek ji leşkerên wî xurasanî bûn û hevalbendên *Abu Muslim* bûn. Rabû *Abu Muslim* ji wan ra nivîsand û ferman da wan ku ew di şer da beşdar nebin. Gava *Ebdullah* ev rewş dît, rabû hevdeh hezar xurasanî dan ber şûran û kuştin. Bi vî awayî

leşkerê wî lawaz bû. Di navbera herdu aliyan da şer di sala 137-ê goçî / 755-ê z. li hinda bajarê Niseybînê pêkhat, *Ebdullah* bazda û çû xwe avêt pişt birayê xwe *Suleyman Bin Elî* waliyê bajarê Besrayê. *El Mensor* soz û biryareka bi nivîskî dabû apê xwe *Suleyman* ku ew *Ebdullah* nakuje. Lê belê ew xiste xaniyekî ku li ser xoyê hatibû avakirin û gava baranê lêkir, xoyê heliya, ew xanî hilweşiya û *Ebdullah* wisa mir⁽³⁾.

Mirovekî din ji malbata *Ebbasî* doza xilafetê li *El Mensor* dikir. Ew jî pismamê wî *Îsa Bin Mûsa* bû. Rabû *El Mensor* ew kire cihgirê xwe ku piştî wî ew bibe xelîfe û kurê xwe *El Mehdî* kire cihgirê *Îsa*. Lê belê gava *Ebdullah* li ser destê *Abu Muslim* hate şikestin, *El Mensor* pismamê xwe *Îsa* ji cihgiriya xilafetê derxist û kurê xwe *El Mehdî* da pêş⁽⁴⁾.

Pilana îxanetê ji *Abu Muslim* ra:

Piştî ku *El Mensor* ji metirsiya *Ebdullah* û *Îsa* xilas bû êdî nobe hat *Abu Muslim*. *El Mensor* pilana kuştina wî danî û destpêkir sûc û tawanbariyan bavêje ser wî. Rabû mirovek bi navê *Yeqtîn* şand ba *Abu Muslim* û jê xwast ku mal û diravê di şerê li dijî *Ebdullah* da bi dest xwe va anîbû pêra hesab bike. Helbet, *Abu Muslim* pir tore bû û hema mabû ku *Yeqtîn* bikuje û nav lêkiribû "*yekî dîn*" (şêt). Rabû *Abu Muslim* got: Ez ji xwînrijandinê ra dilsozim, lê ji mal û dirav ra doxmanim (xayînim)?! Û dijûn ji *El Mensor* ra kirin. Helbet *Yeqtîn* ev tişt gihande *El Mensor*⁽⁵⁾.

El Mensor ditirsiya ku *Abu Muslim* bigihîne Xurasanê, nawenda hêzdariya wî. Bi behaneyê ku ew li nêziya wî be û ji wî ra arîkar be, ew kire waliyê Şam û Misirê. *Abu Muslim* tore bû û got: „*Tu min dikî waliyê Şam û Misirê û ji berê da Xurasan wilayeta mine*“! Rabû tevî leşkerê xwe di nav basûrê Kurdistanê ra berê xwe da Xurasanê. *El Mensor* ew bi serdanî vexwende ba xwe, lê *Abu Muslim* ev nepejirand û got niha ti dijminên xelîfe neman ku ew jê bitirse. *Abu Muslim* êdî ji xewn û xulyan rabûbû, û dizanîbû ku malbata *Ebbasiyan* hêz û şiyana wî ji bo armancên xwe bikar anîbûn, û ew têvedabû ku xwîna pir kesan birijîne; gotibû ku gelek poşman bûye û ji xwedayê bala mihirdarî û bexşîn xwastiye⁽⁶⁾.

El Mensor siyaseteka duqolî li gel *Abu Muslim* ajot, yanê bi du şeweyên cuda li gel wî tevdişerîya. Ji hêlekê da nameyên nerm û nazdar jêra dişandin, û ji mîrên *Ebbasiyan* û rêveberan jî dixwast ku ew jî nameyên wisa jêra bişînin, jê bixwazin ku ew bê serdana xelîfe, jêra bêjin ku xelîfe ji wî hezdike û naxwaze ti ziyane bi wî bike. Lê ji hêla din va destpêkir ku dor-medara wî vala bike, bi nehîna name ji dost û rêveberên wî ra dişandin ku wan bi aliyê xwe va bikişîne û wisa cihgirê *Abu Muslim* bi aliyê xwe va kişand û soz da wî ku wî li cihê *Abu Muslim* bike waliyê Xurasanê.

Piştî wê, *El Mensor* nameyeka bi gef û gur û pir hişk nivîsand û da dostekî *Abu Muslim* yê bi navê *Abu Hemîd El Merwerzî* û jêra got: Tu destpêkê bi nermî pêra biaxive û jê bixwaze ku asê nebe; heger nepejiran, hîngê vê nameya hişk bide wî. *Abu Hemîd* wisa kir û dema ku *Abu Muslim* ev nameya bi gef û gur dixwend, nameyek ji cihgirê wî yê li Xurasanê jêra hat ku têda dibêje: "*Em li dijî xelîfeyên Xweda û malbata pêximberiyê asê nabin, tu jî li dijî îmamê xwe dernekeve*". Hîngê *Abu Muslim* bêhtir kete xem û duşintiyan û zanî ku êdî cihgirê wî duxmanî û xiyane lê kiriye û heger ew berê xwe bide Xurasanê, ewê li dijî wî raweste⁽⁷⁾.

Wê hîngê *Abu Muslim* li bajarê Hilwanê (li başûrê Kurdistanê) bû û ji Xurasanê gelek dûr bû. Ji neçarî ew vegeriya bajarê El Medayîn û çû pêrgîna *El Mensor*. Bi wî ra تنها sê hezar leşkerên wî hebûn. Xelîfe soza selamtiyê da wî û ji hemû mîr û rêveberan xwast ku bi xweşî û dilekî fireh pêşwaziya wî bikin û jêra piştrast bikin ku xelîfe gelek bîra wî kiriye, ew bi hêminî û emanete. *Îsa Bin Mûsa* (pismamê *El Mensor*) jî jêra got ku ew di bin parastina wî da ye. *Abu Muslim* gihîşte El Medayîn û çû serdana *El Mensor*. *El Mensor* jê xwast ku vegere cihê rûniştina xwe, xwe bişo-veşo û vehese. Û wisa her roj ji ya dîn bêhtir jêra mêhvandarî, îkramî û xizmet pêşkêş dikir⁽⁸⁾.

Di serdana dawî da, *El Mensor* ferman da nobetdarên xwe ku 4 nobetdarên tund li paş meclîsa xwe li pişt perdeyê bi cih bike, û dema ku ew li çepik bide bila ew derkevin û *Abu Muslim* bikujin. Wisa *El Mensor* rûnişt û wek her roj *Abu Muslim* hat, silav da wî, silava wî vegerand û destûr dayê ku ew danîşe û pêra axivî. Hîngê jê xwast ku ew şûrê (şemşîr) xwe bide wî daku lê temaşe bike. Piştî ku *Abu Muslim* bê şûr ma, êdî bi hişkî dest bi peyvan kir, sûc û tawan avêtin ser û dest bi hejmartina helwestên wî yên dijminane kir. "*Abu Muslim got: Tu van tiştan ji mi ra dibêjî, piştî ku heya ji min hat, min ewqas xeber û ked da?! El Mensor got: Kurê xinîzan, her tiştê ku te kir di saya me da bû û bi bextê me bû. Heger koleyeka reş jî di cihê te da ba, wê ev karê ku te kiriye bikira*". Û her ku çû peyvên giran avêtin ser *Abu Muslim*.

Hîngê *Abu Muslim* xwast ku xwe xilas bike, lêborîn ji *El Mensor* xwast û destên wî ramûsan, lê belê êdî pir dereng bû. *El Mensor* got: "*Bila Xweda min bikuje, heger ez te nekujim. Hîngê çepik li destên xwe dan. Nobetdar ji pişt perdeyê derketin û bi şûran li Abu Muslim dan û El Mensor got: Lêxin, bila Xweda destên we bibire. Abu Muslim piştî derba yekem gotibû: Mîrê bawermendan" Min ji dijminên xwe ra bihêle!. Wî got: Bila Xweda min ticar nehêle, ma dijminek ji te dijmintir heye?". Dijûn jêra gotin û bi stûnekî li wî da. Nobetdaran ew kuştin, serê wî jêkirin, laşê wî perçe perçe kirin û avêtin ava çemê Dîjleyê da ku şopa wî bê wendakirin. Gava leşkerên wî nûçeya kuştina *Abu Muslim* bihîstin hilwestiyan. *El Mensor* ferman da ku dirav û zêran li serekên wan belav bikin û wisa ew ji hev belav bûn⁽⁹⁾.*

Wisa *Abu Muslimê Xurasanî* xizmeta *Ebbasiyan* bi dilsozî, bi dil û can kir, hemû dema xortaniya xwe ji bo organîzekirina alîgirên, civandina mal û diravan, rêvebirina leşkeran û ajotina ewqas şerên giran derbas kir, di roj û demên gelek tirsnak ra derbas bû, *Dewleta Umewî* roxand û li cihê wê *Dewleta Ebbasî* avakir. Bi vî awayî jî xelîfe *El Mensor* ji bo keda wî ev tişt anî serê wî. Kuştina wî di sala 137-ê goçî / 755-ê z. da bû û temenê wî 37 sal bûn.

Jêder

¹ Ibin El Esir: *El Kamil l fi El Tarix*, 5/51, 56.

² El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 7/472.

³ El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 7/474 - 475, 8/9. Ibin El Esir: *El Kamil l fi El Tarix*, 5/57.

⁴ El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 8/9.

⁵ El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 7/483.

⁶ El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 7/482. Ibin El Esir: *El Kamil l fi El Tarix*, 5/57.

⁷ El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 7/484. Ibin El Esir: *El Kamil l fi El Tarix*, 5/58. El Zehebî, *Sîret E'lam Ennubela'*, 6/64.

⁸ Ibin El Esir: *El Kamil l fi El Tarix*, 5/60. El Zehebî, *Sîret E'lam Ennubela'*, 6/69.

⁹ Ibin Xellikan, *Wefeyat El E'yan*, 3/154. El Tabari, *Tarîx El Tabari*, 7/488. Ibin El Esir: *El Kamil l fi El Tarix*, 5/60 - 63. El Zehebî, *Sîret E'lam Ennubela'*, 6/65 - 66.